Barzanîyan bi mîranî berxwedan kirin û di destpêkê de hinek serkeftin bi dest xistin lê nikarin li hemberî hêza pircek û cebilxanê û firokên şer yên Ingîlizan, li

berxwebidin. Pişti we buyerê Şêx Ehmed û malbatê Barzanîyan neçar man di havîna sala 1932-an de derbasî bakure Kurdistanê bibin. Lêbihara sala 1933-an dewleta Tirkîyê Şêx Ehmedê Barzanî ku wê demê rîberê siyasi û olîyê hereketê bû, bi çend şervanên wî jî Tirkîyê teslimî dewleta Îraqe kirin. Ji vê tarîxê û pêde di dîroka serhildana Barzanîyan de rûpelê durketin û derbiderîyê vedibe û jîyanek tijî êş û buyer di nava Kurdên başûrê Kurdistanê de dest bêdike. Dema ku Mistefa Barzanî ev bêbextîya dewleta Tirkîyê dît, ji wir ber

jîyanâ dûrî coxrafîya Kurdistanê jî bibin. Bi wateyek din jîyanâ dûrî cîya û newelên Kurdistanê jî bo Kurdan pir nexwêş e û malbatê wan yên ji Kurdistanê hatin durxistin, li benda derfetek bicuk bun vegeerin welatên xwe Kurdistanê.

Şerê cîhanê yê duyemîn Pirsigireka Kurd u Doza Mistefa Barzanî:

Şerê cîhanê yê duyemîn derfetek gîring ji liv û xebata siyasiya kurdên başur û rojhîlatê Kurdistanê re afirand ku di warê ramyarê (politîk) de ji bo netewa xwe karekî bikin.

Sala 1943-an partiya Hîwa bi serokatîya nemir Refiq Hilmî xebatek nîhînî û bi dîsplîn di bajarêne Îraq û Kurdistanê de didan meşandin. Berpirsiyaren

partîya Hîwa, Mistefa Barzanî pişti 10 salan derbiderî û jîyanâ hêşîrîyê ya di destê karbi destêne dewleta Îraqê de, ji bajarê Silêmaniyê bajarê Sînoyê li Rojhîlatê Kurdistanê kirin. Di wan mercen nazik û hessas de vegera Mistefa Barzanî ya ber bi Kurdistanê tirs û xofek mezin xiste dilê karbdesten herdu dewletan her yekî bi qasî 50.000 dînar an ji bo kuştin an ji anina serê Barzanî dan diyarkirin. Xuyaye ku ev hejmîra bilinda diravê ku ji bo serê Barzanî hatibu diyarkirin, giringîya xebat û bizava Kurdan ya di bin serokatîye Berzanî di wê demê de dide eşkere kirin.

Bi hezaran sal e ku kurd bona azadîyê şer tike

Lê Mistefa Barzanî pişti jîyanâ rewşa wan salen ku li durî Kurdistanê û di bin çavderîya berpirsiyaren dewleta Îraqe de derbas kiribû, vê carê bi hurbulî xebiti ku hêzek leşkerî ya rîkubêk li dora xwe bicivîne. Ji bona wê jî di 28.07 Julaya sala 1943-an de bi awayekî nîhînî ji rojhîlatê Kurdistanê vegerî cihwarê bav û kalên xwe Barzan û di demek kurd de karê zêdetir ji du hezar (2000) pêşmerge û şervanên mîrxas li dora xwe kombike. Bi vî rengî Mistefa Barzanî serhildana xwe ya duduyan di Julaya sala 1943-an de da destpêkirin û şoreşa Barzan ya duyemîn ji heyâbihara sala 1945-an berdawam bu. Di vê serhildanê da ji Kurdan li hemberi hêzîn dewleta Îraqe gelek serkeftin bi dest xistin.

Di çaxê şoreşa Barzan ya duyamîn de ji 2-ê Oktobra sala 1943-an heyâ 10-ê Novambra sala 1943-an dijwartirin şerên bixwîn



rastîya dîrokî bu ku di navbera Kurdan de hevgirtinek bihêz pêkhatîbu. Lê mixabin merc û rewşa siyasiya cîhanê, dîroka Kurdan ber bi rîyek din ya berovajî berjewendîyê Kurdan ajot.

Yekemîn serhildan û şorêşa Barzanî di roja 9-e Sibata sala 1931-an (09.02.1931) de bi beşdarbuna 80-ê şervanên Kurd di bin serokatîya Mistefa Barzanî de di şerekî bi navê (Berqê Begê) li diji artêsa Îraqê destbêkir. Di vî şerê ku pişte di domandina qedera siyasiya Kurdên başûrê Kurdistanê de rolekî girîng list, hêzîn artêsa Îraqe bi giranî li hemberi şervanên kurd şikestê xwarin û xisarek canî û maddî ya zêde bi dewlwta Îraqe ket. Li hemberi şehîdbuna 5 peşmergâyên Kurd û birindarbuna hejmarek kêm ya şervanên kurd, artêsa dewleta Îraqe 126 kuşti û bi sedan birîndar li pey xwe hîştibun.

Ev tê wê wateyê ku di çaxê serhildana sala 1931 û 1932-an de êdi tiwan û hêza Mistefa Barzanî wek rîberekî şareza li hemberi hêza dûjmin bi temamî hatibu eşkere kirin.

Di şere Dola Vajîya de Mistefa Barzanî yê 28 salâ bi wan şarezîyen ku li ser taktikên şerê partizanî hebun, karî bi hevkarîya şervanên xwe 235 esker û fermandarêne artêsa dewleta Îraqe bikujin û bi sedan kes jî hêzîn dewletê jî di vî şerî de birindar bun. Ev di helakî da bu ku ji şervanên Barzanî tene 12 kes hatibun şehîd kirin. Di vî şerî da jî ber wan hêriş û berwanîyen ku li gor zanist û taktikîn şer bênumune bun, stîrka şansê Mistefa Barzanî wek rîber û serleskerê kû jê hatî roj bi roj gestir bu û wî karî di nava Kurden hemu Kurdistanâ mezin da hêzek menewi ya bilind biafirîne. Bona wî vî şerî ne tenê di nava Kurdan de belkî di nava medya dewletên cîran û cîhanî de ji dengekî bilind veda. Ji bona bêtir nasandina van calakîyen dîrokî li ser hereketê Barzanî pewîşiyek girîng bi lêkolînên akadêmik û zanistî heye.


Bihara sala 1932-an artêsa Îraqe bi hevkarî û piştgirîya hêza esmanî û leşkerîya dewleta kedxara Brîtanîya, hêrişek giran bir ser herêma Barzan. Gundê Barzan ku wek navendeke

bi cîyayê Kurdistanê cu û xwe teslimî dewlwta Îraqê nekir. Lê li ser daxwaza Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî jî xwe gîhand cem birayê xwe (Şêx Ehmed) yê ku di girtîgeha bajarê Musilê de bu. Mistefa Barzanî herçend dizanî ku jîyanek tal û nexwêş li benda wî ye lê ji ber tewazî û qanûnê malbatî, bi kîfxweşî jîyanâ girdîgehê ji xwe re hilbijart.

Sala 1932-an di çaxê jîyanâ hêşîrî û dilketîda Barzanîyan dê, dewleta Îraqe bi rînmûnîya axayê xwe yên Brîtanî Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî û malbatê Barzanîyan berê şandin bajarê Musilê û pişte jib bo Nasirî, Kifîr û Pirde (Alton Kopri) û di dawîyê de ji bo Silêmaniyê sirgun kirin.

Di dawîya bihara sala 1936-an Mistefa Barzanî jî bo gotubêjîn dîplomatîk bo bajarê Musilê hat vexwîndin, lê berpirsiyaren dewleta Îraqe li wur Barzanî girtin û bi kiryareke durî exlaqe mirovanatiyê walîyê Musilê ye wê çaxê xwest ku bi dayîna jehrê, wi ji holê rake, lê Mistefa Barzanî pişti du hefteyan ku ketibu hale bêhîşyê, ji mirinê rizgar bu.

axa bav û kalên xwe Kurdistanê



partîya Hîwa ji bo berfiehkiranî kar û xebata xwe ya siyasi û leşkîrî ku bikaribun ji hêza serlekerekî şareza mîna Mistefa Barzanî û şervanên wî mifayê wergirin di 12.07 Ji sala 1943-an de organîzasyona nîhîniya endam û sempatê

di navbera hêzîn Kurd û hêzîn dewleta Îraqe de qewimîn ku di tevaya şerên çêbuji de rejîma Îraqe rastî xisarek mezina maddî û mrovî bu û bi hezaran leşkeren wan canê xwe ji dest dan.


(dûmahî rûpêla 8)

# Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gênel Mistefa Barzanî

(despêk rûpêla 7)

Di dîroka azdîxwazîya gelê kurd ya li Başûrê Kurdistanê şerên şoreşa Barzan ya duyemîn an ku şerên Şaneder, Xêrizok, Gurêtû, Mezinê û şere Meydana Morîkê cîhekî girîng digirin ber xwe. Îdî ji wê şoreşa duyemîn û pêda mora netewayîfî bunê bêtir zêdetir ruyê xwe di hereke Barzanîyan de daxuyakirin û partîya Hîwa û hemu efser û serleskerên Kurd ku di nava artêşa Îraqe de mijûlî xizmete bun bi rihek niştimanperwerî piştgirîya vê serhildan û bizava netevi kirin. Xisara mali û canî ya ku dewleta Îraqe li hemberî şervanên Kurd tuş bibu ew neçarkirin ku di 29-ê Novembera sala 1943-an de dawa gotubêjê ji seroke herketê Mistefa Barzanî bikin.

Di 15-ê çirîya paş sala 1945 (15.01.1945) - an de encumena Azadiyê hat pekanîn. Desthilatdarîya Îraqe li derfeteke digerîyan ku hêzên xwe xurd û berfireh bikin û bi derbeyeke yekcarî şoreşa Barzanî tekbişkîne, lê Kurdish ji bawerîya xwe bi desthilatdarîya Ereban



nedihanîn. Bi vî awayî zemineya serekî din di navbera herdu alîyan de hat duristkirin. Gotubêja di navbera herdu alîyan de negêhîst tu encamekê û bi sere 25-ê Augusta 1945-an (25.08.1945) hevdîtinê du alî bi dawî hatin.

Kurdan careke din di 5-ê ciriya peş sala 1945-an de (05.09.1945) di şere bi nave Meydanê Morîkê de hemasîyek dîrokî afirandin. Di vî şerî giran de artêşa Îraqe bi ji destdayîna 480 kuştî û 80 dîlan ji esker û fermadarîn xwe carek din bi vî heqîqetê hasîyan ku nikare bi tenê li hemberî şervanên kurd li berxwe bide. Ji ber ku di şerî navbirî de kurdan tenê 5 kuştî û 7 birîndar hebûn û nav û bangê berxwedana kurdan li her çar perçen Kurdistanê gerîya. Îdû kurdîn hemu Kurdistanâ mezîn, Başûrê Kurdistanê ji xwe re kirin Keşbeyîa gêhîştina xwezî, hesret û cîbicikirine daxwazîn xwe yên netewî. Di wan salan de Mistefa Barzanî herçend hê di jîyane de bu jî Kurdîn hemu dînyayê re bibu lîderekî efsaneyî.

Dema ku şoreşa Kurdan

pêşket, dewleta Brîtanya dîsan bi piştgirîkirina ji dewleta Îraqe, careke din qedera siyasiya Kurdenî Başûrê Kurdistanê guherand. Lî idî navê Mistefa Barzanî mîna xebatkar û serokekî qehreman li her dera Kurdistanê bi camêri belav bubu.

## Barzanî û Komara Demokratîka Kurdistan (Mihabad 1946):

Piştî şerê bi navê Meydanê Morîkê dewleta Îraqe bi hevkarîya hêza esmanîya Brîtanya ku jib o berjewendîyen xwe yên aborî hemu yasa û qanûnen mirovanetiye binpê dikirin, karê Barzanîyan tuşî sikeşte bikin û newekhevîya hêzen her du alîyan, Şêx Ehmed û Mistefa Barzanî neçarkirin ku bi biryarek nu di 11-ê Oktobra sala 1945-an (11.10.1945) de ji rîya Keleşîn ya nezikî bajarê Sînoyê bi armansa hevkarîya komara Demokratîka Kurdistan bi hejmarek mezin xwe bigîhînîn Rojhîlata Kurdistanê û malbatê Barzanîyan li heremîn Mirgewer, Tirgewer, Sino, Nagedî û Mihabad hatin bi cîh

Mistefa Koşnav, Mîrhac û Reis İzzet di bin berpirsiyariya wî de bun. Damezirandina Partî Demokratî Kurdistanî Îraq, Tekcuna Komara Kurdistan û Meşa dîrokî ber bi Sovyêtistanê:

Salakê piştî damezrandina Partî Demokratî Kurdistan (piştî Partî Demokratî Kurdistan Îran) piştî şewra ku bi Pêşêvaye Şehîd Qazi Mihemed û karbideşten komara demokratîka Kurdistanê re hatkirin, di 16-ê Augusta sala 1946-an (16.08.1946) de Partî Demokratî Kurdistanî Îraq ji di bin serokatiya Gênel Mistefa Barzanî de ji bo bizava Kurdenî Başûrê Kurdistanê hat damezrandin. Piştî ku di dawîya sala 1947-an de komara Dêmokratîka Kurdistan têkçû, Mistefa Barzanî bi hisyarbunek zêde xebîti ku li hemberî dewlîta Îrane berxwedanê bike û bê zerer û zîyan ber bi sinorê Kurdistanâ Başûr û Bakur hereket bike.

Di 31-ê Adara sala 1947-an de dema ku Mistefa Barzanî û şervanên wî pêhesiyank û Pêsewa Qazi Mihemed hat idamkirin, xemgîni û bêdengîyek mezin ket nava wan.

Di 15-ê nîsana sala 1945-an de hemu malbatê Barzanîyan bi serokatiya Şêx Ehmedê Barzanî vegeerin. Başûrê Kurdistanê û xwe teslimî berpirsiyaren dewleta Îraqe kirin. Mistefa Barzanî ji meşa xwe ya dîrokî di 6-ê gulana sala 1947-an de ber bi Yekitîya Sovyêtî, da destpê kirin. Lî meşa wan ya xwe va ji Mihabadê derketin û di yekemîn hefteya meha Adara sala 1947-an de şerî Nalosê di nawbera her du alîyan de anku hêzên Kurd û Îraniyande qewmi. Ji wê û pêda heya dawîya Adara sala 1947-an şerîn Gucar (gundeki herêma Mirgever), enîya Sîno û Nagedê, şerî Qarnê li herema Xanê û şerîn Ewrîsî û Helec li herêma Mirgever ku di tevaya şeran de hêzên Îranî bi berxwedaneken mezina hêzên Barzanî re ru bi ru mabun, di navbera her du alîyan de qewmin.

Di 3-ê Nîsana sala 1947-an de(03. 04.1947) di navbera hêzên Barzanî û artêşa Îranê û caşenî ku hevkarîya dewleta Îranî dikirin, şerî Nêrgî an ji Berêzer(li Mirgever) çêbu ku Mistefa Barzanî bi xwe ji di vî şerî de bi sivikî birîndar bu. Ji ber şertîn nebaşen hewayê (etmosfer), destpêka biharê serok Barzanî û şervanên wî di 19-ê nsîsan 1947-an de neçar man ku vegeerin nava axa başûrê Kurdistanê. Lî zexta dewleta Îraqê û hêsbûna Şêx Ehmedê Barzanî û malbatê Barzanîyan, Melle Mistefa neçar kirin ku bi hêzek taybetî ku ji 502 pêşmergeyên herî mîrxas pêkhatibu di 25-e Nîsan sala 1947-an(25. 04. 1947an) xwe bigîhîne gundê

Bayê li bakure Kurdistanê.

Lê artêşa dewleta Tirkîyê jî li hemberî hatina wan kete nava tevgerê û ew neçar man 2 roj

bi hemu top û tank û balefirêne xwe demek dirêj bu ku amadekarîyên xwe kiribun, di her sê rojan de bi giranî şikestê



piştî anku di 27-ê nîsana sala 1947-an de xwe bigîhînin gundê Cermê(an ji Cermî) û Bedkarê li rojhîlatê Kurdistanê ku dikevin jîrîya cîyayê Şehîdan. Li wê derê li şerî cîyayê Xehîdan Mistefa Barzanî bi denegeki xemgîn û bîhêz wiha got:

Geli pêşmergeyan!! Binêhirin, ji şerî vî cîyayî em golla Wanê û Urmîyê her duyan jî dibînin, her du jî cîhwarê herî kevnare jîyana bav û kalêne mene, lê li ser vê axa xwe em mehkumî, mirin û revê ne û dagirkerên Kurdistanê nahêlin em li ser axa xwe di rihefîyê de bijîn. Guneha me tenê Kurdayetî ye, hisyar bin û eme biser bikevin, cimkî em ji xwe re dixebeitin...!( Mistefa Cihangîr Şatî yek ji wan 502 kesan bu ku bi serok Barzanî va çubu Sovyetistanê).

xwarin û piştî ku bi sedan kuştî li pey xwe hîştin (yanî biqasî 271 kesan) bi dehan kes ji serbaz û fermandarîn artêşa şahenşahî ji bi dîl ketin destê hêzên Barzanîyan.

Di 18-e hezîrana sala 1947-an (18.06.1947) de Mistefa Barzanî piştî 51 rojan meşa xwe ya dijwar, şervanê herî dawîyê ji 502 servanên hêza xwe bu ku ji rubarê cema Erezê derbasî nava axa Sovyetistanê bu.

## Jîyana li Sovyêtistanê û siyaseta Baqîrov li hemberî Barzanîyan:

Di 29-ê ilona sala 1947-an de Gênel Mistefa Barzanî û cend kesenî derdora wi bi destura dewleta Sovyestistanê pisti 40 rojan ji bajarê Nexçewane ber bi Baku paytextê komara Azerbaycanê hatin veguhastin.



Hereketa Barzanî û şervanên wî ber bi sînore Îran û Yekitîya Sovyêtî didome û ew ber bi heremî Maku dimeşin. Di 9-ê heya 11-ê Gulana sala 1947-an de şerîn mezin û berfireh di deşta Makuyê û cîyayê derdora wê de sê roj û sê şevan bi giranî di navbera her du alîyan de berdewam bun û di vî şerî dijwar de herçend artêşa Îranê

(dûmahî rûpêla 9)

# Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gênel Mistefa Barzanî

(despêk rûpêla 8)

Baqîrov (Serokkomarê wê demê yê komara Azerbaycanê) ji destpêka hatina hêzên Barzanîyan bi helwestek şovêniştî dan û standin bi wan re dikirin. Xuyabu ku ew ji di bin tesîra desthilatdarên komara Tirkîyê de mabu ku hebuna netewa kurd ïnkar dîkin û Kurdistanâ bakur di wan salan de di bin sîya esmanekî reş û bi goman de mabu. Bona hebuna Kurdê komara Azerbaycanê jî ku bi hejmara xwe ji kurdê komara Ermenistanê zêdetir jî bun, ji alîyê desthilatdarên komara Azebaycanê ve dihat ïnkar kirin.

Li ser helwesta nifşparêziya Baqîrov di 29-ê Tebaxê 1948-an de Barzanî û hevalên wî ji bajarê Baku ber bi Taşkend (paytextê komara Uzbêkistanê) hatin veguhastin û li nêzî wî bajarî hatin bi cîh war kirin.

Di 13-e Adara 1949-an de bi pilan û komployen Baqîrov û bi destura berpirsyarên para parastina Yekîtiya Sovyetistanê M. Barzanî ji hevalên wî cuda kirin û li herêma derya Ûral bi awayekî desteser(dest bi ser) û di bin çavderîya tund û tûj de, demeke dirêj jîyana xwe derbas kir. Lê karbidestên Sovyetistanê di 9-ê İlona sala 1951an de careke din Mistefa Barzanî

Di çaxê desthilatdarîya Xuruşov de rewşa sîyasî û jîyana Barzanî û hevalên wî hineki baştar bibu.

**Desthilatdarîya Ebdulkérîm Qasim, vegera serok Barzanî bo Îraqê û Beesî:**

Piştî ku di 15-ê tîrmehê sala 1958-an de komek ji efserên Îraqî bi serokatîya Ebdulkérîm Qasim desthilatdarîya xanedana paşayêن Haşimî û Nurî Seîd bi zerbeyek eskerî ji holê rakirin, di 6-e çiriya pêş sala 1958-an de Mistefa Barzanî piştî 11 sal û nîvan derbiderî û jîyana durî Kurdistanê, li ser vexwesdina Ebdulkérîm Qasim vegerîn Îraqê û li Bexdayê bi cî û war bun. Pêşwazîya ku di çaxê vegera serok Barzanî de ji alîyê kurd û ereban ve jî hat kîn, pir germ û buyerek dîrokî bu. Mistefa Barzanî pir xebitî ku xwe bi şert û mercen rewşa sîyasîya Ebdulkérîm Qasim re biguncîne û heta hinek gotinê wî hebun ku gele kurd hez nedikir û bi başî nedidîtin ku serokekî mîna Barzanî ji Qasim re bêje:

**"EZ XWE BI SERBAZEKÎ WE DIZANIM"**

Lê Barzanî bi van gotinan dixwest xurtura efserekî xwedî desthilat, têr bike û gelê Kurd û ereb di nava aştiyê de bi hevre bijîn. Di destpêkê de Ebdulk-

şoresek din ya li dijî dewleta Îraqê bu.

Di hemu hevpeyvînên ku gênel Mistefa Barzanî bi rojnamevanen biyanî re pêk anîne, ew hertim li ser biratîya gelan û jîyane tekijî astî bê saskirin.

**Barzanî di hevpeyvînike xwe de dibêje:**

"Em aştiyê dixwazin û bila şer bi dawî be ku kurd û ereb bi awayekî birayane û di nava aştiyê de bi hevre bijîn...! (Ji hevpeyvînike têlêvîzyonî ku rojnamevanekî İnglîzî pere çêkirîye).

Di 11-ê İluna sala 1961-an de Mistefa Barzanîye nemir soreşa xwe ya ku 14 salan berde-wam bu li dijî rîjîma Ebdulkérîm Qasim û Beesîyê ku piştî wî hatin, dadeşpêkirin.

Mezin buna Mistefa Barzanî de vê rastiyê de yê ku wî karî bi xebat û çalakîyên xwe ji serokatîya hoz û eşîretekê, sal bi sal ber bi pêşve bimeşe û di nava dîroka xebata bi şan û şerfa netewa Kurd de weke serokê neteweke bê hezkirin. Di wan salan de Mistefa Barzanî wek nûnerê pirsgireka millîya Kurd li hemu cîhanê dihat nasandin. Ji bona wê jî başurê Kurdistanê bibû qada hevdîtina rojnamevan û siyasetvanen biyanî bi serokê Kurd Mistefa Barzanî re.

Di 8-ê Sibata sala 1963-an (08. 02. 1963) de rîjîma Ebdulkérîm Qasim bi alîyê Beesîyan ve hatibu lidarxistin, tekçû û Ebdulkérîm Qasim hat kuştin. Barzanî ji bo ku di wê dema dijwar de azadîxwazên kurd û ereb bi destê Beesîyan neyîn kuştin, derîye Kurdistan û heremên azadîkirî ku di bin desthilatdarîya partîya wî de bun, ji wan re vekirî hîşt û bi vî awayî gelek kesan cane xwe ji destê Beesîyan rizgarkir. Di wan rojîn hessas de ku Bexda bibu qada tolhildana Beesî û alîgîrîn rîjîma Ebdulkérîm Qasim, ev siyaset, dûrdîtina û mîrxasîya Mistefa Barzanî carek din hîzr û ramanê mirovhezîya wî ji herkesî re dan ispatkirin.

Piştî ku ji salen 1963-an heya Sibata sala 1968-an desthilatdarîya Îraqê di navbera Ebdulselam Arîf û Beîsîyê de dest bi dest dibu, wan piştî ku hemu dijberen xwe serkutkirin, vê carê berê xwe dan Kurdistanê û heya Adara sala 1970-an şerrîn dijwar di navbera herdu alîyan de qewmîn. Piştî xebata salen giran di 11-ê Adara sala 1970-ê de li pey gotubêjîn dur û dirêj di çarçoveya desthilatdarîya Îraqê de otonomî ji Kurdistan Kurdistan re hat diyarkirin. Xuyabu ku Beesî û mijûlî kar û bar destpêka

neben û li benda derfeteke bun ku kar û barê xwe yê desthilatdarîyê rîk û pêk bikin û piştre dîsan bi Kurdish re bikevin nava şer û hereketa Kurdistanê bi yek carî bifetisînin.

ji alîyê Rojava û Amêrika ve wek jandarme Rojhilata Navîn dihat hesibandin, mezintirin xiyaneta dîrokî li Kurdish kî. Piştî wê bi sedhezaran Kurd ji başurê Kurdistan mişextî Rojhî-



Ev sirra wan bi kiryareke hovane zu ji Kurdish re eşkera bu. Yanî dema ku di 29-ê İlona sala 1971 an (29. 09. 1971) de istîxbarata Îraqê bi şandina çend kesen di kincen meletiyê de xwest ku rîberê şoreşê Mistefa Barzanî bikuje û ew di vî karê xwe de bi ser neketin, careke din şerîn dijwar di navbera herdu alîyan de dest pêkirin. Vê carê dewleta Îraqê xebitî ku bi hevkarîya hêzek sîyemîn şoreşa Kurdish tuşî şikeste bike. Şer di

Adara 1974-an de bi germî li hemu heremên başurê Kurdistanê dest pêkiribû. Di Adara sala 1974-an de dewleta Beesîyê Îraqê qanuna xwe ya otonomîyê îlam kîn. Lê Mistefa Barzanî ji ber mesela Kerkuk, Xaneqîn û Musilê qanuna otonomîya ku dewletê îlam kîn, nepejirand û ew otonomîya Beesîyan otonomîyek leyîskî bi nav kî. Ji bona wê jî di Çirîya pêş sala 1974-an de bi qasi 17 mehan conta Beesîyan bi hemu şeweyen hovane, hîrişî ser gund û bajarê Kurdistanê kîn. Bi vî rengî Beesîyan mirin, reşerojî û derbiderî li hemu Kurdistan direşandin. Wê demê jî cîhan li hemberî van kiryarek Beesîyan kerr û bêdeng bu û xaça sora (Heyva Sor) cîhanî ji bi ci şeweyan hevkarîya kurdan nekirin, ji ber ku ew ji di bin tesîra dewleta Îraqê da mabun û ev jî berêvajî zagonen vê rîexistina cîhanî bu. Di nasandina pirsgireka Kurd de şoreş û xebata Barzanî roleki bercavî list.

Mistefa Barzanî piştî ku li bajarê Kereçe hat bi cîh kîn, di hemî salê de çu Amêrika û di 1-ê Adara sala 1979-an dema ku gelê kurd piştî tekçûyîna rîjîma sîtemkara 2500 salîya Şahenşahî li Iranê li bendê bun ku Mistefa Barzanî vegere Kurdistanê û şoreşek nu li dijî dewleta Îraqê bide dest pêkirin, bi nexweşîya kanserî li nexweşxaneyeke Amêrikayê wefat kî.

Di roja 5-ê Adara sala 1979-an de termê Mistefa Barzanî bi merasimeke li bajarê Sino ku bi sedhezaran kes têde besdar bubun, hat veşartin.

Lê piştî mirinê ji termê Mistefa Barzanî dîsan bu armanca komployen dewletên dagirker ku dixwestin Kurdish bi destê Kurdish bidin kuştin. Mihaciret û derbiderî li ser axa Kurdistanê heta di çaxê mirinê de ji dev ji Mistefa Barzanî bernedida.

Di 6-ê çiriya pêş sala 1993-an termê serokê Kurd Mistefa Barzanî û kurê wî nemir İdrîs Barzanî ji gundê Helecê yê di herema Mirgewer de vegeandin cîh warê bav û kalê wî herema Barzan. Mistefa Barzanî di dîroka sîyasîya gelê Kurd de buye nirxekî gelempere û wek lîdîr û serokê doza bi şan û şerfa Kurdistanê hê jî di dilê gelê xwe da dijî.

Amadekar:  
Tahir Silêman



vegerandin Taşkendê.

Di 5-ê Adara sala 1953-an de Josêf Stalîn mir û Xuruşov wek sekreterê giştî û serkarê Yekîtiya Sovyetistanê ji alîyê Partîya Komunist ve hat hilbijartîn. Li gor telîmata Xu-rushov, Barzanî li paytexta Sovyetistanê (Moskovayê) hat bi cîhwar kîn û çend caran ji wan bi hevre hevdîtin pekanîn.

erîm Qasim wusa da diyarkirin ku Îraq welatê kurd û erebave û gel li benda rojîn xweş bu ku du netewa bikarîbin di aşîtî û wekhevîyê de bi hevre bijîn. Lê alîyê Kurd û Ebdulkérîm Qasim li ser pirsgireka Kurd li hevnehatin û di Adara 1961-an de Melle Mistefa Barzanî bi yekcarî ji Bexdayê vegerî Barzan û mijûlî kar û bar destpêka

Peymana Elcezayer, rewşa doza şoreşeyî Eylülê û Wefata Serok Barzanî:

Di 6-ê adara sala 1975-an de Îraq û Iran bi navbeynkarîya serokkomarê Elcezayîrê (Hewari Bu mîdyen) û girêdana peymana Elcezayîr lihev kîn. Mihemed Riza Sahê Pehlewî ku



**BÊWAR  
BARÎ  
TEVFÛRÎ**

### 8-ê Adarê

îro 8-ê adarê cejna jina  
Eyda dayikan  
Cejna te jî pîroz dayika kurd  
îro di destê dayikan de  
Yên hemûyan de  
Gul û sosin  
Cavên wan de ken, esq.  
Bengizê wan bi kubar,  
Li ser lêvê wan hezar yek deng,  
Distîrên stranê qeseng,  
Şadibin bi dilekî qenc.  
îro cejna jina,  
Eyda dayikan.  
Cejnê pîroz dîkin dayik,  
Li hemû deran.  
Bi şadîman.  
Cejna te jî pîroz, dayika kurd.  
Lê di welatê minda,  
Di destê dayika kurd de tunene  
Gul û sosin.,  
Di bengizê wêda keder,  
Nêrînên wêda hesret,  
Pejmûre.  
Li meydanada dimeşe,  
Destê wêda heye wêneyek,  
Cavên wêda dilopek  
Hêsr.

Li ser zarê wê dîlok  
Dilorîne.  
Dilorîne zeman-zeman,  
Mekan-mekan,  
Bi dilekî şewat  
Stranê wêda axîna ewlad,  
Rizgarîya welat.  
8-ê Adarê jina kurd pîroz dike  
Li zîndanan de  
Tî û birçî  
Sergot û tezî  
Ji bo rewşa jina kurd  
Bila mirovahî şerm bike .

Dayika kurd cejnê pîroz dike  
LI QADAN BI MEŞ  
Di destê wêda hertim alek sê reng  
Daxwaza wê, rawestin şer  
Aştîyêda ,Wekhwîyêda bijîn insan.  
Tunebin koledar, dagirker.  
Dayik bijîn bê hesret, Bê keder.  
Jin dayika mirovahîyeye, tiverike  
Ji bo rewşa jina kurd,  
Ji bo halê dayika kurd  
Bila erd

Esman  
Insan  
cîhan  
şerm bike.  
\*\*\*

LI BER RAMAN Ü  
ÇALAKYÊN DAYKA KURD  
JI BO REWŞA JINA KURD  
Rojeke pir bi rîzda  
Ev hêzîn dagirker  
Bi poşmanîke mezinva  
Yê çok vedin ,bitewin....

3.03.1998.

### Herêma Kurdistanê bi fermî ji aliye rêxistina ISO yê ve hate nasandin

Herêma Kurdistanê bi fermî ji aliye rêxistina ISO ya navneteweyî ve hate nasandin.

Rêxistina International Organization for Standardization (ISO) yê li

ser daxwaza cîgîrê serokê hikûmeta Herêma Kurdistanê Qubad Talebanî ku Herêma Kurdistanê bi fermî ji aliye wê rêxistinê ve bête nasandin û ew daxwaz di warê kirdarî de pêkhat.



### 8ê Adarê û Rewşen Xanim Bedirxan wek Sembola Jina Kurd a Têkoşer

Xweyîngino! Ez careke din dibêjim me jînê Kurdistanî îro, yên ko nifşê miletê me yê ayindê li ber destê xwe bixwedî dîkin, me dû wezîfeyên giran hene: hînbûn û hînkirin. Ji lewra ji me re divêt berî pêşîn em bibin şagirît û di pey re mamoste: mamosteyê zarokên xwe.. (Rewşen xanim Bedirxan / Hawar No: 27 / 1941) Bi vê helkeftinê (8 Adarê), bi min xweş e ku hinekî ronahiye berdim dor navê Rewşen xanim Bedirxan, wek jînek kurd ku xebat û bizav di ber rewşen-bîriya Kurdi de kiriye û navê wê di huş û bîra kurdan hatîye tomár kîn. Belê berî ku ez derbaşî mijara xwe bibin, pêdivîye ku ez bi rengekî panoramî û bi kurtî rewşa jina Kurd di çerxê 20 an de, di ber çavan re derbas kim.

Di destpêka çerxê 20 an de, navê hin jînê kurd di nav tevger û civata kurdî de hatine diyar kîn, ewê ku li kîleka mîrê kurd sekinîne û pêre besdarî di bûyerên Kurdisanî de kîne. Çi di warê têkoşîn û berxwedanê de û ci di warê rewşenbîri û civakî de. Di sala 1908 an de, piştî mirina İbrahim Paşayê Mîlî, jîna wî (Xensa Paşa), şûna wî girtiye û bi kar û barê hoza

Milan ve rabûye. Di sala 1920 an de, keç û jînê Bedirxaniyan komelek bi navê



jînê li Stenbolê, ji bo mafê xwe yê windayî ava kîrine.. Di nîvî çerxê 20 an yê pêşîn de (Hefse Xanim Neqîb), nav û dengekî bilind di Kurdisanî de daye û hatîye naskirin wek pêşewaya Silêmaniye; hem bi çalakiyên xwe di ber jîna kurd de û hem bi bervedêriya xwe di ber mafê gelê kurd de. Mala vê şerejîna kurd li Silêmaniye wek dibistanekî bû ji jînê kurdan re û çendî car vê jîna kurd hawar û gazîya kurdan gîhandîye Ewrûpa û ew bû ya ku komara demokrat li Mehabad pîroz kî..

Di salên 1927-1930 û de jî navê Yaşar xanim, kebaniya qehremanî kurd Îhsan Nûrî Paşa di nav gel de bi mîranî hatîye

belav kîn û bi saya wê gelek jînê hoza Celaliyan besdarî şerê Romê bûne... Di

sala 1946 an de, Mîna Xanim Qazî, kebaniya Pêşewa Qazî Mihemed roleke berz di şiyarbûna jînê Mehabadê de lîstiye, hem jî qencî jêreye ku wê bingehê yekîtiya afretên komara Mehabadê danî ye. Li gor xwendin, xepartin û serwextiya min ji civata kurdî re û ji gelek rexan ve, mîze dikim ku jîna kurd li gel mîrê kurd rolek berçav lîstiye. Belê ji

ber gelek sedeman ve, navê wê di tariyê de maye, hêj ew ronahiya pêdivî nehatîye berdan ser kar û xebatê wê..

Sebareti Rewşen xanim Bedirxan, wek rewşenbîrek Kurd a jîn; rolek berz di şiyarbûn û tevdana hestê netewî de lîstiye, nemaze di warê rewşenbîri de. Ew yekemîn jîna kurd e ku bi elfabeya Kurdi latînî nîvîsandiye û di vî warî de alîkarî bi kurmamê xwe mîr Celadet Bedirxan re kîriye.. Nexasim di derhênan û weşandina herdu kovarîn wê de; Hawar û Ronahî.. Hem jî bi navtêdan û dehifdana wê û Mîr Celadet nîvîskarîn wek Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedîrî

Can hatine holê. Piştî koçkirina mîr Celadet di roja 15.07.1951 û de, Rewşen Xanim di sala 1955 an de komelak bi navê (Komela Vejandina Çanda Kurdi), li Şamî damezirandiye, di gel Dr. Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Hemîdê Derwêş.. û ji wê hingê ve, bi rengekî aktîv bi karê rewşenbîri rabûye.

Rewşen xanim Bedirxan kî ye? Neviya mîrê Cizîra Botan e, dotmama û kebaniya pispor û zimanînê bejin bilind mîr Celadet Bedirxan e. Ji Bedirxaniyan pir belav di çar kenarîn cîhanî de, ew mabû ku, pêmayê Bedirxaniyan jî, dîroka Cizîra Botan, mîrgeha mîr Bedirxan, serboriya mîr Celadet û Dr. Kamîran li ser refîkên pirtûkxaneya hiş û xeyalê xwe de diparast û di mala xwe de bi zimanê kurdî bi keça xwe Sînem xan û kurê xwe Cemşid re diaxîfî.

Li gor her 83 salên ku di sere derbas bîbûn, danûstandin wê bi welatparêzên kurdan re hebû û tev jêre bîbûn pend, zanîn, kurdzanîn û zanîndan.. Ta berî ku koça dawî bike, Rewşen Bedirxan a tekane bû di nav Bedirxaniyan de ku navê Bedirxaniyan diparast. Wê jî mîna herdû pismamîn xwe Mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan ew şop dimeşand..

Konê Reş, Qamişlo, 08.03.2015

### Hikûmet: Rola jinan di şoreş û berxwedanê de rolek sereke ye

Hikûmeta Kurdistanê bi minasibeta 8-ê adarê roja cîhanîya jinan bi peyamekî pîrozbahîyê li jinan dike û rol û xeba jinan di şoreş û berxwedanê gelê Kurdistanê de li dijî zilim û bindestiyê bilind dinixîne.

- Di vê bîranînê de, ji bo wan xûşkên qareman yên di çeperê pêşmergayeitî û berxwedanê de ji bo mafê neteweyî û niştimanî canê xwe gorî kîriye, em bejana xwe ditewînin. Hikûmeta Kurdistanê de peyama xwe de dibêje ku, bîranîna vê rojê, bîranîna xebata berdewama zêdetir ji yek qîrn û nîva ye ku, jîn, azadîxwaz û wekhevîxwaz li dijî bindestî û îhmalkirina jinan û ji bona azadî, wekhevî û edaletea civakî dixebeitin:

- Cîyê şanaziyê ye ku, jîn li Kurdistanê li meydana xebat û tekoşînê de, tevî ku ew hertim mil bi milê mîran bûn, di heman demê de ew ji jînê her civakeke din têkoşertir bûn.

Dayîk û xûşkên me, weke her dayîk, xûşk û keçen şehîdên rîya rizgariya me, hertim xem û wezîfeya giran ya şoreş û



berxwedanê ketiye ser milêwan, hertim bi çalakî besdarî di xebata rizgarîxwaza gel û netewaya xwe de kîriye. Jin li civaka Kurdistanê bi kîryar îspat kîriye ku di hemû warênu û ji bona azadî, wekhevî û edaletea civakî dixebeitin:

Hikûmet bi minasibeta 8-ê adarê di peyama xwe de dibêje ku, xweragîr, dilsozî û moralâ dayîk, hevjin, xûşk û keçen her civakeke din têkoşertir bûn.

### Roja Jinan a Cîhanê li Silêmanî bi coş hate pîrozkirin

Roja 8-ê Adarê ya Jinan a Cîhanê li Berde Qehreman a Silêmanîye bi tevîbûna sedan jîn û xelkê herêmî bi şahiyekî hate pîrozkirin.

Şatû Mehemed ve hate xendin.

Di peyamê de roja 8-ê Adarê li hemû jinan hate pîrozkirin û diyar kir ku wê têkoşîna jinan bidome heta dawî li sîstema tecrîd û



Rêxistina Jinê Azad ên Kurdistan (RJAK) û Tevgera Jinê Ciwan ên Têkoşer hevpar li Berde Qehreman a Silêmanîye 8-ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê bi şahiyekî mezin a tevîbûneke xurt pîroz kîrin.

Peyama RJAK û Tevgera Jinê Ciwan ên Têkoşer ji aliye

êşkence ya li İmrâlî li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulla Ocalan tê sepadin bînîn, wê têbikoşin.

Pîstre peyama Tevgera Azadî û Meclîsa Îştar a Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî Mexmûrî hatîn xwendin û di van peyaman de bal kişandin ser rola jînê têkoşar a li dijî sitemkarî û

şer hebûn û kerameta gel û welêt diparêze, ji qaremanî û dilsoziya wan pêşmergeyan nekîmtir e û ew zilma mezina derheqê dayîk û xûşkên êzidî hatî kirin, yek ji tawanên herî mezin yên mirovatiyê ye:

- Hikûmeta herêma Kurdistanê geleb bi cidî û bi qenaet di karnameya xwe de pirsa wekhevî û mafê jinan weke pirensîpeke sabit a mafê mirov û demokrasiyê, tesbît kîriye û di karnameya xwe de cîyek giring jê re daye. Niha jî, ji bilî hebûna deste û saziyên hikûmetê yên taybet bi jinan û parasatina mafê wan, li herêma Kurdistanê ji bo xebat û tekoşîna çendîn rîxistinê medenî yên taybetmend bi warê jinan û mafê wan aqarek xweş heye. Ev yek jî wezîfeyeke neteweyî û mirovî ya giring e û hikûmet, tevî berdewambûn li ser piştgiriya van karan, karê zîdetir û karîgertir jî ji bo vê pirse dike.

tundiyê. Her wiha hate gotin ku wê berxwedana jinan heta serketinê dom bike.

Di dewama şahiyê de Koma MA (Mezopotamya) ji Bakurê Kurdistanê û dîsa Koma Em a Kurdên Xoresan, li gel Hunemend Jîna û Adil Hawremî derketin ser dikê û coşa şahiyê zêde kîrin.

Endamê Koma MA Hêlin Kilîçaslan li ser coş û heskirina gel a li beramberî wan ji ANF'ê re axivî û got: "Bi hatîna vir kelecaniyek mezin da me. Eleqeyek zêde ji bo me hate nîşandan û germ em pêşwazî kîrin. 8-ê Adarê li hemû jînê cîhanê pîroz dikim.

Gel li ber stranê hunermen dan govend gerandin û dirûşim qîr kîrin.

Herî dawî şahî bi dirûşmîn 'Jin, Jiyan, Azadî' û 'Bîjî Serok Apo' bi dawî bûn.

## Li Hewlêrê forûma avakirina derfetên kar wê bi amadebûna Serokwezîr birêve biçe

Li Hewlêrê forûma avakirina derfetên kar û pêşdebirina pîşesaziyê wê bi amadebûna serokê hikûmeta Herêma Kurdistanê ve birêve biçe.



Li gor Serokê Desteya Hilberînê Dr. Mihemed Şukrî diyar kiriye: "Di bin çavdêrî û bi amadebûna Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ve û bi hemahengiya Wezareta Bazırganî û Pîşesazî û Desteya Hilberînê ve, forûma herî mezin a giringî dayîna pîşesazî û avakirina derfeta kar dê bê kirin.

Mihemed Şukrî eşkere kiriye: Ew forûm, wê roja 06.03.2022yê li Hewlêrê birêve biçe û Mesrûr Barzanî wê behsa bernameya hikûmetê ya dema borî û ya pêşerojê bike, herwiha behsa bi bingehkîrina navçeya pîşesazî û avakirina derfeta kar jî bike.

Herwiha Serokê Desteya Hilberînê destnîşan kiriye, armanca forûmê pêşxistina zêdetir a sektora pîşesaziyê ye û eşkerakirina hewldanê kabîneya nehem a Hikûmeta Herêma Kurdistanê yên ji bo avakirina derfeta kar e.

Mihemed Şukrî da zanîn, di forûmê de aliyêne pêwendîdar wê amade bin û herwiha dê şaraza hebin, avakirina derfeta kar û giringî dayîna zêdetir ji sektorêna cuda re bi taybet jî pîşesazî wê bêne gotûbêjkirin.

**PeyamaKurd**

## Di merasîmê de... Bîranîna serhildana gelê Kurdistanê

Roja şemiyê 5/3/2022 li bajarê Raniyeyê bi amadebûna hejmareke zêde ji berpirsîn hizbî û hikûmî bi boneya bîranîna serhildana gelê Kurdistanê merasîmîn girseyî yên bi heybet hatin lidarxistin.

Di destpêka rêuresmê de, şaredarê navçeya



Raniye Husên Mehmûd gotarek pêşkêş kir û tê de bixêhatina mêtvanan kir û tekez li ser wê yekê kir ku xelkê bajarê Raniye li dijî neheqî û zulmê rabûn ser piyan û bajarê wan bû dergehê serhildanê.

Got jî: Xelkê bajarê Raniye li dijî hovtîrîn rejîma



diktator serî hildan û qurbanîdanê mezin ji bo azad-kirina gelê Kurdistanê dan û rûmeta bilindkirina serhildanê bi dest xistin, û em iro pîrozbahiya tomarkirina dîrokeke bi rûmet li gelê Kurdistanê dikin. Qaymeqamê Raniyeyê daxwaz kir ku piştevaniya bajêr bikin û bûdcyekê ji bo cîbicîkirin û temamkirina çend pirojeyen giring û stratejî yên ku li bajarê Raniye hatine ragirtin, ji bilî piştevanîkirina welatiyan û handana sermayedaran bo pêkanîna pirojeyen çandinî û pîşesazî li herêmê.

**pukmedia.com**

## Gelo, wezîr û parlamentêrên Kurd li Bexda yê çi karî dikin

dikin.

Kar û xebata wan a li Bexdayê qasî misqalek be jî dbê ew ji bo kurdan be.

Partîyên Kurd, ji bo temsîl û wezîrê ji bo Bexdayê jî di nav xwe da dijiminatîya hevdû dikin. Wek tê zanîn ku ew şer û pevcûn jî, ji bo berjewendîyê kurdan nakin. Ji bo mûce û berjewendîyê xwe û ji bo partîyê xwe wî dozê dikin.

Roj bi roj rewşa kurdên li derveyî rêvbirina herêmî, xirab dibe. Lê partîyê kurdan li Bexdayê ketinê pê mûcayan û lavayê Ereban dikn.

Iro tiştîn ku têr serê kurdan, qet wextekî nehatîye qebûlkirin. Kurdên başûr di dîroka xwe da, tucar ji xirabî û ji zilma dijmin, bê deng û bê bersîv nemane.

Iro Partîyên Kurd di her warî da hevdu sûçdar dikin, lê dema li Bexdayê parvekirina wezîr û mûcayan were rojevê, bê pirsgirek lihev dikin.

Iro Pêşmeregoyê herdu partîyân ji çarsed hezarî zêdetirin. Lê mixabin qasî dema Mele Mistefa Barzanî, bandora wan li ser rîvebirên Ereba tune.

Rêvebirîya Hikûmeta Kurdistanê, iro bi parlemento, bi desthilatdarîya sîyasî û leşkerî pêşî li van pirsgirêkîn girîng negre, ew dê pir û pir poşman bibin.

Cîgirê Serokê Parlementoya Iraqê Beşîr Hedad iro dibêje, "pişti ragihandina dema hilbijartînê bêwext ji alîyê serokwezîrê Iraqê va, xebatê erebkirina deverên Kurdistanî dîsa bi xurtî dest pê kirine!"

Cend roj berê dadgeha destdûrîya Iraqê, ji bo herêma Kurdistanê, dahata petrolê qedexe kir.

Pirsa dawî, Ereb bi kêfxweşî mala kurdan xirab dikin.

Kurd jî ji Ereba ra malê avadikin.



**Sirac Oğuz**  
naynîn rojevê. Hê bi çavên biratî, aşitî û bi dostane bi hikûmeta Bexadayê ra tevdigerin. Ji bo Ereba jî avakiina hukûmetê wek pirsgirêka xwe dibînin. Di dema avakirina



Kurd di bin, zilm û zordarîya Ereban da bê xwedî mane.

Iro Kurd, li Başûrê Kurdistanê, xwedî nîvdelet in. Xwedî parlemento û serok û serokwezîr in. Lê çîma nikarin bi rîyeke, peşî li van xirabîya bigrin. Ew bûyerên diqewimin tenê di nûçeyan da cîh digrin û pişt ra jî tê jibîrkirin.

Lê parlemen û rîveberên Kurdistanê, van pirsgirêka zêde

hukûmetê da gelo nikarin van pirsgirêka bînîn ziman. Nîjadperestekî mîna Walîyê Kerkûkê, Cûbûrî nikarin ji kar dûr bixînin.

Eger ku nikarîn van pirskirêkîn çareser bikin ci karê wan li Bexdayê heye.


Heta roja iro ew wezîrên di nav hukûmetâ Iraqê da cîh girtine, ji bo milletê Kurd ci kirin. Ji bo ci alîkarîya hukûmet û gelê Iraqê

## Ez Û Alî Gurdilî Û Roja Felsefeya Kurdî

Ev nîvîsa min ji berî çend salan ve ye. Ji dema ku mamoste Alî Gurdilî xwedîyê malpera (Felsefeyan), ji min xwest ez tiştîkî li dor 9-ê Adarê wek roja Felsefeya Kurdi, binivîsim.. Wê hingê çendî ponijîm, min nas nekir çîma wî 9-ê Adarê wek roja felsefeya Kurdi bijartîye?! Pêre pere jî, vê roja 9-ê Adarê koça dawî a hunermendê kurd Mihemed Şêxo anî bîra min. Yê ku ji berî 33 salan ve di 9-ê Adara 1989-an de li Qamişlo çûye ber dilovaniya Xwedê.

Wek ku diyar e, meha adarê bi piraniya rojê xwe, bi bûyerên kurdewariyê, ji şîn û şadiyê ve neqîsandiye. Di vê heyvî de jî, çerxa felekê bi gera xwe ya normal dizivire.. Xwerist kirase xwe yê bûkaniyê li xwe dike û xaka welatê me yê qedexe bi rengê kolkezîrîn (Keskeler) tê xemîlandin. Agirê Cejna Newrozê jî di 21ê wê de li ser çiya, zinar û girêne welatê me belû û eşkere xuya dike.. Bav û kalêne jî ji bo vê rojê gotine: (Bist û yekê Adarê şev û roj hat qîrarê).

Ez jî, bi pêşniyar û bijartina mamoste Gurdilî ji bo vê rojê, kêfxweş bûm û min di dilê xwe de got: çîma na.. 9-ê Adarê jî rojek ji rojê destpêka biharê ye, xweş e ku ev roj û felsefeya kurdi bi hev ve bêne hunandin. Nexusim ku xwediye bijartina vê rojê guhdana



**Konê Res**

wî bi felsefeya cîhanî heye û bi hewildane ku bingehê felsedeya kurdi, li gor zanîn û serwextiya xwe belav bike. Çîma em ê piştgiriya wî nekin û nav têde nedîn? Çîma emê rî nedînê ku felsefeya kurdi ji qirêj û gemarê dawêşîne, pak û paqîj bike û em pê re li felsefeya Cizîrî, Xanî, Haci Qadirê Koyî, Goran, Bêkes, Mîr Celadet Bedirxan û Cegerxwîn vegeerin, perpêl bikin û şanî hev bidin.. Û wek ku pêşiyen me gotine: Nû hatin kevin xelatin, an Li serê cara hêr hêr meke, tiştî bi te nexweş bi hevalê xwe meke. Û bi hezaran ji van gotinê huşmendî û aqilmendîye ku bav û bapîrêne me di nav xwe de afirandine û ji hev re gotine.

Felsefeya me, ya ku temenê

wê li hezarê salan vedigere.. ji ber neguhdan, nenivîsandin û qedexebûna zimanê me ve, xelkê gelek jê kiriye ji milk û malê xwe, gelek jê winda bûye û yê mayî, di nav edebiyata devkî de hatiye parastin wek; gotinê pêşîyan, mamik, çîrokê ser zimanê teba (Rovî, Şêr, Gur, Dîk, Keftar, Hirç..), bê ku baş bêne nîvîsandin û şirovekirin.. Û felsefeya Mîr Bedirxan, yê ku di heyamê xwe de gotiye: (Dîn, dîne Xwedê ye em tev birayên hev in). Û gelek nimûneyen din hene.

Jixwe pêşketina miletan bi bîr û baweriyên feylesof, huşmend û aqilmendîn wê ye. Aqilmendî felsefe ye. Mirovê feylesof, aqilmend e. Ew e yê ku xweşî û geşiyê ji civaka xwe re dibijêre, di ber de xwe diwestîne, gazî û hawar dike ku civaka wî di rehetî û pêşketinê de bijî. Di vê biwarê de, ez spasiya mamoste Alî Gurdilî dikim ku wî ev barê giran hildaye ser milê xwe û ev deriyê nû şanî me daye.

Bav û kalêne jî ji mîj ve gotine: (Heçî berê gula zerê), ew gulek zer e. Xuya ye gula zer di nav me kurdan de ji tev gulê rengîn yên din biqîmetir e? Gelo ji ber ku rengê wê û rokê ji hev in?

Not: Min ev gotin di sala 2016-an de nîvîsandie. Min hinekî tik-tikandiye.

**Qamişlo, 5.03.2022**



## Serok Barzanî: Raperîn 1991ê yek ji serwerî û destkeftên giranbiha yên gelê Kurdistanê ye

Serok Mesûd Barzanî bi boneya salvegera 31emîn a Raperîna 1991ê, peyamek belav kir û ragihand, Rap-

bilind ên şehîdan û Pêşmergeyên qehreman û yek û bi yekê welatiyên xweşdivî yên Kurdistanê dikim.



erîn yek ji serwerî û destkeftên giranbiha yên gelê Kurdistanê ye û ji bo gelê Kurd derfet bû, ji bo ku cîhan li êş û azarêngelê Kurdistanê agahdar bibe.

Peyama Serok Barzanî ya ji bo salvegera Raperînê:

"Bi navê xwedayê mezin û dilovan

Bi helkefta sîh û yekemîn salvegera Raperîna mezina gelê Kurdistanê, pîrozbahiyê li malbatêngelê

Raperîn yek ji serwerî û destkeftên giranbiha yên gelê Kurdistanê, serhildana xelkê ya li dijî dam û dezgehêngelê sîtemkar û dagîrkeran peyameke gelek rûn û zelal bû ku ji bilî hebûna zulm û sîtemê, xwesta azadîxwazi û rûbirûbûna sîtemkariyê herdem li Kûrahiya dilê mirovê Kurd da hebû û dimîne. Şanaziyeke din a raperînê, yekrêziya gel û Pêşmerge û aliyên siyasî û plan û dûrbîniya serkir-

dayetiya siyasî ya Kurd bû. Ev yekrêzî bûye faktereke bihêz ku li serdemeke aloz û tarî da serkeftin û azadî bê mîsoger kirin.

Raperîn ji bo gelê Kurd derfet bû, ji bo ku cîhan li êş û azarêngelê Kurdistanê agahdar bibe û ji bo parastina gelê Kurdistanê hengavêngelê kirdarî bavêje. Her wiha derfeteke bêwêne bû ji bo piştbestina bi şîyanêngelê Kurdistanê û wergirtina wan mafêngelê ku salêngelê dûr û dirêj hatibûn desteserkin.

Raperîn hilgirê biha û waneyê mezin bû. Di raperînê de gelê Kurdistanê, mînaka biha û rewşbilindî û çanda xwe jî pêşanî cîhanê û navçeyê da. Bi hezaran serbazêngelê artêşa rejîmê ketin destê xelk û Pêşmerge, lê belê bi tenê yek kes jî nehat azardan û serpişk kirin ku biçin derveyê welat, yan li Kurdistanê bimîn, yan vegerine nava hikûmetê.

Di bîranîna raperîna mezinângelê bihara 1991 ê Kurdistanê de, tekeziyê li ser peyama aşî û azadîxwaziya gelê Kurdistanê dikin. Ev peyam divê ji bo heta hetayê bilind û zîndî bimîn.

**Mesûd Barzanî**

05.03.2022"

## Nêçîrvan Barzanî: Raperîna 1991ê bawerî û ıradeya bihêz a gelê Kurdistanê bû

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi boneya salvegera 31emîn a Raperîna gelê Kurdistanê de peyamek belav kir.

Daxuyaniya Nêçîrvan Barzanî waha ye:



"Bîranîna 31 saliya serhildana bi rûmet li adara sala 1991ê bi germî li malbatêngelê Kurdistanê û pêşmergeyên mîrxas û hemû Kurdistanîyan li navxwe û derveyî Kurdistanê pîroz dikim.

Serhildan derbirîna xwestek, bawerî û ıradeya bihêz ya gelê Kurdistanê bû ji bona jiyan û paşerojeka baştırgelê û azad, serferaz û redkirina sitem û zordariyê bû, Berhemê xebat û qurbanîdana pêşmerge, gel û cemawerê serhildayî û yekrêziya aliyên siyasî û pêkhateyên Kurdistanê bû.

Serhildan deriyê vekirî yê Kurdistanê bû ji bo qonaxeka nû ya xwebirêvebinê û damezirandina saziyên şerî û fermî yê Herêma Kurdistanê ku pişîti azadiya Iraqê di destûrê da hatine bi cî kirin, di navxwe û cîhana derve jî da bi fermî hatine nas kirin û danûstandin pê ra tê kirin.

Di vê bîranînê da, em careke din tekîd dikin ku parastina azadî û destkeftiyêngelê serhildanê û mafêngelê destûrî yê Herêma Kurdistanê, erk û berpirsiyariya hevbeş ya hemû Kurdistanîyan û wefadariye ji bo canê paqîjê şehîdan û hemû qurbanîyen rîya azadiyê.

Bila ev bîranîn bibe palderek ji bo zêdetir bihêzkirina canê biratiyê, bihevrabûnê, yekrêziyê û kûrkirina pêkvejiyanê, hevduqeþûlkinê, lêbihurînê û karkirin ji bona wan armancêngelê şehîden serhildanê û hemû şehîden Kurdistanê canê xwe li serdانا.

Tevî teqez kirina pêbendbûna me bi armancêngelê serhildanê, em bi hêvî û umêd, bi bawerî û geşbînî ji bo paşerojeka baştırgelê û rîz û hurmet ve bîranînê şehîden sehildan û hemû şehîden Kurdistanê dikin.

**Nêçîrvan Barzanî**  
Serokê Herêma Kurdistanê"  
Hewlêr-KDP.info

## Mihemedî Hacî Mehîmûd dîsan bû sekreterê partiya Sosyalîst

Mihemedî Hacî Mehîmûd dîsan bû sekreterê partiya Sosyalîst û birayê wî jî cîgir e.




Îro roja şemiyê 5-3-2022'an li bajarê Hewlêr Partiya Sosyalîst a Demokrata Kurdistanê konigireya xwe ya 7mîn lidar xist.

Her weha di wê konigireya 7mîn de, careke din Mihemedî Hacî Mehîmûd wek sekreterê giştî yê Partiya Sosyalîst a Demokrata Kurdistanê hat hilbijartîn û birayê wî Ebdulah Hacî Mehîmûd jî wek cîgirê sekreterê giştî yê Partiya Sosyalîst a Demokrata Kurdistanê hate hilbijartîn. Bi amadebûna 1000 endamî, li bajarê Hewlêr Partiya Sosyalîst navê xwe jî guhert û ji Partiya Sosyalîst a Demokrata Kurdistanê bû bi Partiya Civakî ya Demokrata Kurdistanê û careke din Mihemed Hacî Mehîmûd bû bi serok û birayê wî jî Ebdulah bû bi cîgirê sekretê. **PUKmedia**

## Heyeta PDK ê bi Muhammed Hebûsî re civiya

Heyetekî PDK ê bi serokê parlementoya Iraqê bi Muhammed Hebûsî re civiya. Hebûsî pêşwaziya heyeta PDK ê ya di bin serpereştiya Fazil Mîrânî de kir.

Hat ragihandin ku her dû teref di civînê de li ser pêşdeçûnê dawî yên siyasî û avakirina hukumeta nû ya Iraqê dan û sitendinan kirin. **PeyamaKurd**



## 31yemîn Salvegera Raperîna Başûrê Kurdistanê Pîroz Be!

Kurdistanê bi giramî bibîrtinîn.

Qezaya Ranya ya Başûrê Kurdistanî de roja 5ê adara 1991ê de şarê ma vera Seddamê diktatorî xoverodayış da dest pêkerdiş. No xoverodayış vilayê pêruna Başûrê Kurdistanî bi. Netîceyê xoverodayışî de Hewlêr, Silêmanîye û Dihok amê azadkerdiş. 1992î de zî bi weçînayışê Parlamentojî Herêma Federe ya Kurdistanî amey ilan kerdiş.

Xoverodayış, 2005î de Qanûnê Bîngehînî yê Iraqî de bi qebûl kerdena Dewleta Federe ya Kurdistanî dewam kerd.

Xoverodayış nêvindert.

Xoverodayış 25ê İlona 2017î de, referandumê xoserîye de bi %93 'erê' semedê xoserîye dewam kerd.

Tu şikê ma ci ra çino ke, her çar perçeyanê Kurdistanî de zî şarê ma heta ke azadîya xo nêgîro xo dest do xoverodayış dewam biko.

Ma serrîgêra Xoverodayışê Başûrê Kurdistanî ya 31ine Pîroz kenî. Şehîdanê xoverodayışî û heme şehîdanê Kurdistanî bi hurmet yad kenîme.

5 Mart 1991 günü Güney Kurdistan'ın Ranya ilçesinde Kurdistan halkı Saddam Hüseyin Diktatörlüğüne karşı başkaldırıyo başlattı. Bu başkaldırı tüm Güney Kurdistan'a yayıldı. Bu başkaldırılar sonucunda Hewlêr, Süleymaniye, Duhok, Halepçe Irak Devleti'nin işgalinden kurtarıldı. 1992'de seçimler yapıldı ve Kurdistan Federe Bölgesi Parlamentosu ilan edildi.

Başkaldırı 2005'te Irak Anayasası'nda Kurdistan Bölgesine Federe Statü'nün resmi olarak kabul edilmesiyle devam etti.

Başkaldırı durmadı.

Başkaldırı, 25 Eylül 2017'de yapılan Bağımsızlık Referandumu'nda Kerkük, Şengal de dahil, Güney Kurdistan halkın %93'ünün bağımsızlığı 'Evet' demeşîyle devam etti.

Kurdistan'ın tüm parçalarında özgürlük elde edilinciye kadar, halkın başkaldırıyo başkaldırıyonun devam edecekinden hiç kuşkumuz yoktur.

Başkaldırının 31. yıldönümünde Güney Kurdistan Raperîni'ni (Başkaldırısını) kutluyor, raperîn ve tüm Kurdistan şehitlerini saygıyla anıyoruz.

de jî bi hilbijartînê Parlamentoya Federe ya Herêma Kurdistanê hate ilan kirin.

Raperînê, di sala 2005an de di Qanûna Bîngehînî ya Iraqê de bi qebûl kirina Dewleta Federe ya Kurdistanê berdewam kirdi.

Raperîn nerawestîya.


Raperînê di 25ê İlona 2017an de, di referandumâna serxwebûnê de, bi %93'ye 'erê' ya ji bo serxwebûnê berdewam kirdi.

Tu şika me lê nîne ku, li her çar perçeyen Kurdistanê jî gelê me heta ku azadîya xwe bidest bixe dê raperîn her berdewam be.

Em 31emîn salvegera Raperîna (Serîhildana) Başûrê Kurdistanê pîroz dikin. Şehîden raperînê û hemû şehîden



# Li Îraqê hûndirê sîstema federal vala dibe / Mehmud Al



## ***İbrahim GUÇLU, siyasetmedar***

Li Kurdistanê her dem bûyerên gelek girîng û dîrokî pêk tê.

### **LI ÎRAQÊ BIRYARÊN LI DIJÎ SİSTEMA FEDERAL...**

Dewleta Federal, dewleta du neteweyan û an jî zêdetir neteweyan e. Dewleta Îraqê jî dewleteke federal e. Dewleta neteweya kurd û ereban û neteweyen din yên ne xwediyê welat in.

Dewleta Federal ya Îraqê, encama têkoşîneke dûrûdirêj a neteweyî û demokratik ava bû.

Pêvajoya Dewleta Federal ya Îraqê di sala 1958an de dest pêkir. Wek tê zanîn Abdûlkerîm Kasim di sala 1958an de desthilatdarî girt destê xwe. Wê demê Serok Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî li Yekîtiya Sovyetan penaber bûn. Desthilatdariya Îraqê ji bona ku Dewleta Îraqê ji nûve ava bibe, mecbûrî kurdan bû. Loma jî Serok Mele Mistefa Barzanî vexwendina Îraqê kir. Beriya ku Serok Barzanî hate vexwendin Îraqê, di derbarê wî de cizaya dardekirinê hebû.

Serok Mele Mistefa Barzanî piştî ku vegeriya Îraqê, makezagoneke nû hat pejirandin. Di makezagonê hat pejirandin ku Dewleta Îraqê ji du neteweyan (neteweya kurd û ereb) pêk tê û li Îraqê du ziman (zimanê kurdî û zimanê erebî) zimanê fermî ye. Wê demê derî ji federalbûna Îraqê vebû.

Hezar mixabin vê pêvajoya erenî dirêj najot. Loma jî Îlona sala 1961an de Şoreşa Neteweyî ya Kurdish dest pê kir. Di sala 1970yî de destilatdariya Îraqê û Baasî, mecbûr ku bi Serok Barzanî û PDKê re peymana Otonomiyê erê û imza bike. Bi avabûna Otonomiya, ji bona Dewleta Federal ya Îraqê gaveke diyardar hat avêtin.

Lê jiyanâ Dewleta Îraqê ya otonom dom nekir. Di sala 1974an de encama êrîşa Dîktatoriya Baasî, ser derket. Di sala 1975an de sîstema nû ya ne-merkezî xirab bû û Otonomiya Kurdistanê têk çû.

Lê li hemberî Dewleta Kolonyalîst ya Îraqê şer

ranewestiya. Ev şera piştî îsgala Kûveytê ji aliyê Dewleta Îraqê ve hat qonaxake nû. Li Kurdistanê Herêmeke azad ava bû. Di sala 1992 de kurdan, Dewleta Îraqê wek dewleta federal diyar kirin û gorî pîvanên federalî li Kurdistanê jiyana siyasî, aborî hat meşandin.

Di sala 2005an de jî encama refîrandumê gel, Dewleta Federal ya Îraqê bi makezagoneke nû ava bû.

Xebat û têkoşîna neteweya kurd, di avakirina Dewleta Federal ya Îraqê de xwediye rolekî gelek girîng û tayînkîr ye.

